

Sûrîya: Daxuyanîyeke Hevbeş der barê astengkirina bikaranîna zimanê Kurdî de

27 Rêxistinên Sûrîyayî doza pênasekirina zimanê Kurdî û zimanên din, weke zimanên fermi li Sûrîyayê dikin, her weha tunekirina siyasetên çewsandinê û cûdakirina zimanî

Rêxistinên Sûrîyayî yên înzeker li ser vê daxuyanîyê, bi şermezarî û tirseke mezin, hewldanên desthilatên veguhêz li şama paytext der barê astengkirina bikaranîna zimanê Kurdî li parêzgeha Heskê, dişopînin. Mînak, bûyera Koşka Dadwerîyê li nava bajêr, ku Hikûmeta Şamê li ser bidûrxistina zimanê Kurdî ji tabloye sereke ya li derve, rijd bû. Tu sedem ji bo van reftaran ji hêla Hikûmeta Veguhêz ve nayên dîtin û bûn sedema tirseke rastîn ya pabendîya desthilatên veguhêz bi rêzgirtina li pîrzimanîyê li deverê, ji ber bikaranîna zimanekî tenê di pênasekirina dezgeheke fermî di devereke pîrziman û pîrşand de ku Ereb, Kurd, Sûrîyan û netewên din lê nişte dibin.

Rêxistinên înzeker dibînin ku kiryarên dawî yên desthilatên Sûrîyayî li dijî Peymana Navdewletî ya Mafê Mirovan e, li dijî prensîb û bendên Ragihandina Destûrî ya Demkî ye, ku bi eşkeretî nîşan dide ku dewlet: "pîrrengîya çandî di civaka Sûrîyayî de bi hemû pêkhatayên wê, di gel mafên çandî û zimanî bo hemû Sûrîyayîyan, diparêze." (Madeya 7an), ev kiryar her weha li dijî madeya 2yem ya biryara (13) ya girêdatî mafên Kuran e.

Dûrxistina zimanê Kurdî ji bikaranîna di warê giştî de, nîşana berdewamîya hişmendîya dûrxistina çandî ye, ya ku Sûrîyayî bi giştî û Kurd bi taybetî bi dehên salan qurbanîyên wê bûn, bi rêya siyasatên sistematîk di dijî nasnameya wan a netewî, çandî û zimanî û hewldanên tunekirina wê di jîyana rojane de.

Rêxistinên înzeker giringîya parastina pîrrendîya çandî û zimanî di avakirina aştiyeke domdar li Sûrîyayê, li ser bingeha qebûlkirin û rêzgirtina li pîrrengîyê, bi bîr tînin. Ev qebûlkirin dikare bibe rêya sereke û bingeheke ya girtina rê li çî nakokîyên bê be, li welatekî ku 14 salan êşa şerê xwîndar û dehsalên çewsandinê der heqê hemû Sûrîyayîyan, ji Kurd, Ereb, Sûrîyan û Aşûrîyan, kişandiye.

Ji ber daxwazên me yên biserketina qonaxa veguhêz, da ku paşguhkirina çandî û zimanî nebe sedema nêaramîyê û sedemeke belavbûna gotara kîne û jinûçêkirina nêaramî û parçebûnê û gefxwarina li aştiya navxweyî li Sûrîyayê, em doza pabendîya bi berpirsariyên navdewletî, û peymanî navdewletî ya mafên mirovan ji desthilatan dikin da ku siyasatên cudakirin û dûrxistinê qedexe bibin.

Danasîna destûrî û qanûnî bo zimanê Kurdî weke zimanekî fermî, vegerandina mafekî rew ye piştî bi dehên salan ji berxwedana siyasî û ya mafan di nav kurdan de, û pabendîya hikûmetê bi beşdarkirina hemû pêkhatayên Sûrîyayî di avakirina pêşeroja welatê wan de di qonaxa veguhêz de, nîşan dide. Ji lew re, rêxistinên înzeker li ser daxuyanîyê ji desthilatên veguhêz dixwazin ku:


1. Danasîna Zimanê Kurdî weke zimanekî fermî li Sûrîyayê ku di warê giştî de, perwerdeyê û dezgehê fermî de, tê bikaranîn.
2. Pabendîya dewletê bi hemû dezgehên xwe, bi piştgirî û çesipandina bikaranîna zimanên navxweyî li Sûrîyayê û danîna qanûn û biryaran ji bo vê armancê.

3. Danîna demlîdest ya biryarên rêzgirtina li pirrengîyê li Sûrîyayê û bihêzkirina bikaranîna zimana di ware giştî de bêyî dîrxistin û tunekirina çî siyasetên cûdaker ku li gor Qanûna Navdewletî ya Mafên Mirovan qedexekirî ne.
4. Pabendîya bi berpirsariyên Sûrîyayê yê navdewletî û avakirina jîngeheke guncaw û piştgirîya pêwîst bo parastina zimanên heyî li Sûrîyayê, di nav de zimanê Kurdî û garantîkirina bikaranîna azad û bê astengî bo ziman.
5. Garantîkirina destûrî bo mafê hemû pêkhatayên Sûrîyayî di fêrbûn û fêrkirina zimanê dayikê de û tevlîkirina wê bo siyasetên perwerdekirin, fêrkirin û çandê li Sûrîyayê .
6. Tawankirina hemû hewldanên helandin û asîmîlekirina ziman û çandên cuda di zimanekî an netewekê de û dîtina van kiryanan weke cudakirina nijadî û dîtina pirrengîya zimanî û çandî weke zengînî û hêzekê bo Sûrîyayê.
7. Çakkirina ragihandina destûrî da ku danasîna eşkere ya pirrengîya çandî û zimanê li Sûrîyayê li xwe bigire û da ku di destûra dayim ya welat de hebe.

Rêxistinên Îmzeker:

1. ASO Consultancy & Strategic Studies
2. Ahrar - Syrian Liberal Party
3. The Union of Intellectuals
4. The Humanitarian and Development Cooperation Organisation (HDC)
5. ACHTI Center
6. Ahlam Saghira
7. Artist Team
8. Ambassadors for People With Disabilities
9. Analysis and Strategic Studies
10. Ella Organization for Development and peace building
11. PÊL – Civil Waves
12. Environmental Green Tress Association
13. Dar Association for Victims of Forced Displacement
14. Syrians for Truth and Justice (STJ)
15. Synergy Association for Victims

16. RÊ for Rehabilitation and Development
17. TEVIN. Independent Think Tank for Kurdish Affairs
18. Shawishka Association for Women
19. Mbader Association for Community Development
20. Ronî Peywend for Community Leadership
21. Peace She-Leaders Network
22. Kobani Organization for Relief and Development
23. Malva for Arts and Culture
24. Rose Organization for Support and Empowerment
25. Nextep Organization
26. Yalda Community Center
27. HÊZ Awareness



ABOUT STJ

Syrians for Truth and Justice (STJ) started as an idea in a co-founder's mind while attending the U.S. Middle-East Partnership Initiative's (MEPI) Leaders for Democracy Fellowship program (LDF) in 2015. The idea became a reality and flourished into an independent, non-profit, impartial, non-governmental human rights organization.

STJ's beginnings were more than humble; initially, it only reported stories of Syrians who experienced arbitrary arrest, enforced disappearance, or torture. Planted in fertile soil, the seed of this project grew into an established human rights organization licensed in the Middle East and the European Union. STJ today undertakes to detect and uncover violations of all types committed in all Syrian parts by the various parties to the conflict.

Convinced that Syria's diversity is a wealth, our researchers and volunteers serve with unfailing dedication to monitor, expose, and document human rights violations that continue unabated in Syria since 2011, regardless of the affiliation of the victims or perpetrators.